

li dewsa wê(destlata zordar) avakirina dewletek zanistî , dêmokratî , perlemanî bi baweriyên cuda û li ser bingheke ne navendiya siyasî , ne riçperest ava dibe û herweha jî divê li şûna vê dewleta setemkar , dewleta dezgehan û yasa pêk were. Herdîsan kongirê dewleta Sûriyê daxwaz kir ku pêwîste ewa hemû hêzên leşgerî û asayêş ji bajaran vekêşîne .

2 –Di sebarete gelê Kurd de; kongira niştimanî weha dupat kir : Gelê Kurd li Sûriyê resen e , ew li ser axa xwe ya dîrokî dijî û ew beşek e ji pêkhatiyên civakî , niştimanî li Sûriyê, lewra pêdivê hebûna milletê Kurd wek pêkahatiyek sereke ji pêkhatiyên gelê Sûriyê û ewa mîna netewa duhem di desturê de were pejrandin .Herweha divê çareseriyek dêmokrat û dadmend ji doza netewayetiya gelê Kurd re were dîtin ,herwisa pêwîste di vê çareçewê de, mafê çarenûsî ji gelê Kurd re di hundir yekitiya welêt de were dupat û tekuz kirin.

3-Kongirê got: Ji ber ku liv û bizavên xortên Kurd beşeke ji şoreşa aştiyane li Sûriyê ye, divê em piştvanîya bizav û livên wan bikin. 3- kongirê dupat kir ,ku divê serbestiya baweriyên olî , rêzgirtin û parstina wan di desturê de hebin, herweha jî divê mafên netewî ji gelê Suryan -Keldo - Aşurî û kêmetewên din re werin parastin.

Dîsan jî, kongirê biryarek rêxistinî pir giring stand ; ango ewê got:Bila hemû çarçewên rêxistinên Kurdî ji holê rabin û nemînin 1-(Enî),2-(Hevbendî), 3-(Hevsazî), 4- (Encûmena siyasî).

Di dawiyê de, kongirê hevdîtin û hevpeyvîn bi çarçewên rêxistinî –niştimanî yên rîkber re spart (Komîta pêkanînê),(ya ku di kongirê de hatiye hilbijartin)û eger kî ji rêxistin û çarçewên niştimanî yên rîkber, pirtir biryarên kongira me bipejrîne , divê hevkarî û hevsazî bi wan re çê bibe .

Di 11.11.- 12.11.2011(komîta pêkanînê ji (45) endaman) civîna xwe dîsan li

li darxist, di vir de danûsatandinên berferh li ser rewşên rêxistinî û siyasî çê bûn;di encamê de ,biryarên giring hatin istandin. 1- Divê hin heval bi navê kongira niştimanî ya Kurd têkeliyan bi hemû partiyên din û hevsaziyên xortan re (yên ku di kongir de beşdar nebû ne) bikin û pêdivî ew deriya kongira niştimanî ya Kurd li Sûriyê ji wan re bê perwa vekin .2- (Komîta pêkanînê) ji biryarên komkarên welatên erebî dilxweş bûn ,lewre jî ,di vir de biryar hate standin ,ku pêwîste nûnerên kongira niştimanî li komcivîna (Komkarên welatên Erebi)beşdar bibin .

Lê ,ji ber ku komcivîna welatên Ereban pir nêzîk bû, tu kesî ji endamên (Komîta pêkanînê)nikanî bû xwe ji bo beşdarbûnê pêşkêş bikira , lewre jî ,(komîta pêkanînê)(6) kes ji Ewropa û endamê (komîta Pêkanînê) rêzdar Ebdil Hemîd Derwîş (niha li Kurdîstana Başûr e) pêşniyar kir ku ewanan li komcivîna welatên Erebi beşdar bibin, deng û daxwazên gelê Kurd bi serdar û berpirsiyarên welatên Ereban û bi hemû hêzên erebî -Sûrî yên rîkber bidin bihîstin. Dawiya civînê de, komîtek çûktir ji (23) endaman; (11) endam ji partiyên kurdî,(12)endama ji kesayetiyên serbixwe bi navê (Nivîsgeha parêzrwerî (Amandarî ,pişterast) ya giştî) ji (Komîta pêkanînê)hate hilbijartin.

Di dawiyê de pir pêwîst e û cihê balkêşiyê ye ku em bêjin ; Kongira me ya niştimanî û civîna (Komîta pêkanînê) pir di heyameke dêmokrat de derbaz bûn, rexne û sirincekêşî bi şeweyên vekirî û zelal dihatin holê,rêberên partiyên me û kesayetiyên serbixwe bi bêhna fereh danûstandin dikirin û rexneyên hevdû bi hilmên xweş û bê awirdan dipejrandin û sûdên rêxistinî û siyasî ji hev didîtin,lewre jî li dawiya dawiyê kongira me biryarên hişmendî , ramyarî li gor gengazî û taybetmendiya rewşa gelê Kurd ji pir aliyan ve li Sûriyê standin. Di paşgotinê de, divê em ji gelê Kurd li Sûriyê re bi kêfxweşî bêjin ; KONGIRA NIŞTIMANÎ YA KURD LI WE PÎROZ BE ! 13.11.2011